Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :885 1-Tebax- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

## Reqs herî zêde li gerîla tê



Li gorî nûçeya ANFê´ya Fereşîn Demhat çêkirî, gerîlaya YJA Starê Sara Cûdî ya ji Êlihê, di 12 saliya xwe de dest bi baleyê kiriye û li çiyayên Kurdistanê jî dev ji reqs û baleyê bernedaye. Sara Cûdî dema ku xwendekar bû, piştî xwendina pirtûka Rêber Abdullah Ocalan ya bi navê ´Divê Mirov Çawa Bijî?´ li riyekê digere. PKK´ê nas dike û tevlî nava refên gerîla dibe. Lê tiştekî wê heye naguhere: “Li çiyayên Kurdistanê jî bi dengê xwezayê re, bê mûzîk min karî bireqisim. Her ku bi xwezayê re bûm yek, hestên min kûrtir bûn.”
***OZGÛR POLÎTÎKA***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | M | A | S | T | ■ | P | A | R |
| 2 | N | Û | ■ | O | ■ | Ç | Ê | J | ■ |
| 3 | A | ■ | Î | R | O | ■ | Ş | ■ | A |
| 4 | L | A | L | ■ | T | E | B | A | X |
| 5 | ■ | S | A | K | O | ■ | Î | Ş | ■ |
| 6 | K | A | W | A | ■ | Î | N | ■ | S |
| 7 | E | ■ | E | ■ | A | C | ■ | L | A |
| 8 | R | A | ■ | A | D | A | R | ■ | Q |
| 9 | ■ | E | T | Ê | ■ | R | E | N | Î |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 2 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 3 | ■ | | | ■ | | | | | |
| 4 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 5 | | | ■ | | ■ | | | | ■ |
| 6 | ■ | | | ■ | | | ■ | | |
| 7 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 8 | | | ■ | | ■ | | | | ■ |
| 9 | | | | ■ | | | | ■ | |

**ÇEP-RAST**

1. Resim
2. Heta hetayê
3. Eşîr, qebîle, hoz... Mîrîtiyeke Kurdan
4. Kurteya Partiya Karkerên Kurdistanê
5. Zîl, ji kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Kurteya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
6. Cejin, eyd... Nexweşiyek... Agir
7. Boyaxa neynokan ... Beyreq, sembola welatan
8. Baneşana keserê... Roja em tê de ne
9. Cînava vegerok... Cephe, bere

**JOR-JÊR**

1. Notayek... Dewara nêr... Pêvedana bi hesinekî sincirî
2. Qertafeke neyînî... Daçekek ku wateyê xurt dike... Pevdenga kurdî
3. Dengê ku ji tiştên dikevin avê derdikeve... Notayek
4. Pirsek di rewşa netewandî de... Ji wî/ji wê
5. Cureyekî zad ku piranî şorbe pê tê çêkirin... Rastêşek
6. Cînava pirsê ya ku tê wateya; li kû ye?... Rojek
7. Keriyê dewaran... Xweliya piştî şewatê
8. Ji bo denglêkirina li kesê kal
9. Aşît, şape, berfende... Yezdanekî misrî

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Antrenor** (Fransî) | **Fêrkarê/a werzişvanan, kesê/a werzişvanan perwerde dike. Rahêner** |
| **Behre** | Jîrî, jêhatin, şiyan, karîn, huner, qabiliyet: Xwendekar bi perwerdeya taybet behreya xwe pêş dixin. |
| **Rahêner** | Fêrkarê/a werzişvanan, kesê/a werzişvanan perwerde dike. Antrenor |
| **Rontgen** (Fransî) | 1. Cûnek ronahiyê ye ku wêneyên hestî û hinavên mirovan yan jî nava tiştan pê tên kişandin. 2. Wêneyên bi wê ronayiyê hatîn kişandin. 3. Makîneya ku ew wêne pê tên kişandin. |
| **Sabotaj** (Fransî) | Derbkirin, xerabkirin, pelişandin, pûçkirin: Bi çalakiyeke sabotajê hat kuştin. |
| **Tansiyon** (Fransî) | Fişara xwînê, zordayîna xwînê: Tansiyona nexweş pir bilind e. |
| **Test** (Ingilîzî) | Kirina tiştekî da bê zanîn ka wê serkeftî be yan na. Ezmûn, ceribandin, imtihan, prove |
| **Tîm** (Ingilîzî) | Çend kes yan tişt yên li gel hev. Deste, kom, taxim |
| **Tomar** | Parastina agahiyan yan berheman di ciyekî de. Qeyd, sicîl: Stiranên kevin tev tomar kirin. |
| **Werziş** | Spor, riyade |

## Li Herêma Cizîrê turnoveya pîng pongê



**Rêxistina Tedemerto ya Geşepêdan û Hevgirtina Civakî bi hevkariya Rêxistina Şar ya Geşepêdan û bi hevkariya Yekîtiya Werzîşê ya Herêma Cizîrê turnoveya Sepro (Emel) ya pîng pongê li dar xist ku tevayiya lîstikvanên Herêma Cizîrê beşdar bûn.**

Lîstika yekê ya turnoveyê li dar ket û wê li hola Dêra Suryan ya Katolîk ya li taxa Wista ya Qamişlo sê rojan dewam kir.

Têkildarî hûrgiliyên turnoveyê rêveberê Rêxistina Tedemerto ya Geşepêdan û Hevgirtina Civakî Rîm Şemûn ev agahî dan: “Me insiyatîfa yekê li dar xist û me xwest bi vê çalakiyê komkirina gelên Cizîrê yên cuda çêbe. Ev werziş lezbûnê, lîstika komî û bedenê xurt dike.”

Rîm axaftina xwe wiha domand: “Me xwest insiyatîfa me ya yekê werziş be, lewra çawa tê gotin, spor jiyan e. Werziş çalakiya yekê ye ku li dijî nijadperestiyê şer kir.”

Rêvebera Rêxistina Tedemerto ya Geşepêdan û Hevgirtina Civakî Rîm Şemûn diyar kir ku 21 lîstikvanên ji tîmên cuda yên pîng pongê yên ji herêma Cizîrê tev li turnoveyê bûne û ev li axaftina xwe zêde kir: “Tîm ji 4 koman pêk tê, kesên ku di turnoveyê de bi ser bikevin wê tev li çaryeke dawî û nîvê dawî bibin.

Çalakiyên turnoveya pîng pongê wê bi belavkirina xelatên ji her sê rêzên destpêkê re bi dawî bibin.
***ANHA***

## Tûrikê Çîvanokan

***Di tûrikê me yê îro de sirûda li ser kal û pîran heye. Kal û pîr nirxên civakê ne. Ji rêzgirtinê pêve tişteke din naxwazin. Mafê wan li ser me heye ku em ji wan hes bikin û rêzê ji wan re bigirin. Weke din gelek tiştên ku em ji wan fêr bibin hene. Kal û pîr ka çawa ji zarokan hes dikin, divê zarok jî wisa ji wan hes bikin. Kal û pîran ji bîr nekin da hûn jî neyên jibîrkirin. Ji wan hes bikin da hûn jî bên heskirin. Guhdarî wan bikin da pişt re li we jî bê guhdarîkirin.***

### PÎR Û KAL

Pîr û kalên welata
Mîna zêr û xelata

Tim dibêjin çîroka
Serhatî û dîroka

Qîmetê wan bizanin
Tiştên kevin dizanin

Pir dîtine rojên reş
Keyfa wan em bikin xweş

Pîr û kalan bînin bîr
Hûn jî rokî bibin pîr

Bi gotinên gelek xweş
Civat bi wan dibe geş



## Tirkiye dixwaze
## Rojhilata Navî bê Kurd be, PDK jî dixwaze başûrê Kurdistanê bê civaka Êzîdî be.



Çawa ku Tirkiye dixwaze Rojhilata Navî bê Kurd be, Partiya Demokratîka Kurdistan (PDK) jî dixwaze başûrê Kurdistanê bê civaka Êzîdî be. Ev jî xetereke mezin li pêşiya yekîtiya Kurdan çêdike. ***R-5***

## *Pêşangeha Şehîd Herekol bi hêviyeke mezin vebû*

Bi durişma “Pirtûk Rehjena Jiyanê Ye”, 29ê Tîrmeha 2021ê bi pêşengiya Desteya Çand û Huner ya bakur û rojhilatê Sûrî li Navenda Çand û Huner ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo Pêşangeha Şehîd Herekol ya pirtûkan ya pêcan hat vekirin. ***R-7***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 885 1-Tebax- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

# JÎ BO FERMAN BÎ DAWÎ BIBIN...



- 1) Dorpêçkirina Şingalê ya ji aliyê PDK’ê û hikûmeta Iraqê ve divê bi dawî bibe
- 2) Divê Êzîdî yekîtiya xwe xurt bikin
- 3) Statûya xweseriya şingalê divê bê qebûlkirin
- 4) Divê Kurd xwe li benda partiyên xiyanetê dikin negirin, yekîtiya xwe ya neteweyî ava bikin.
- 5) Bi yêkitiya Kurdan re divê li hemberî êrişên qirkirina Kurdan Şerê Gel yê Şoreşgerî bê xurtkirin



## ‘Qebûlnekirina statûya Rêveberiya Xweser nakokî ye’

» 21`ê Çileya 2014an li rojavayê Kurdistanê Rêveberiya Xweser hat ragihandin. Lê heta niha ji aliyê dewletan ve bi fermî nehatiyê qebûlkirin. Berî niha ji bo qebûlkirina Rêveberiya Xweser li ser tora civakî kampanyayek li ser asta cîhanê hat destpêkirin û ket rêza 3’yan. ***R-4***




## Pergala Rêber Apo bû roniya riya azadiya jinên Êzîdî

» Êrişên DAIŞ’ê yên li ser Şingalê fermana 73’yan ya li hemberî civaka Êzîdê bû. Bi hezaran zarok, jin, zilam, kal, pîr hatin kuştin; 5 hezar jin jî hatin revandin û li sûkan hatin firotin. Caziya diyar kir ku, wê hesabê vê fermanê ji sûcdaran bê xwastin. ***R-3***

## Beşên nû li qonaxa amadeyiyê zêde dibin

Bi armanca teşwîqkirina perwerdeya pîşesaziyê û pîşeyî, Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Rêveberiya Xweser ya Herêma Cizîrê îsal amadekariya zêdekirina şaxên nû li qonaxa amadeyiyê dike. ***R-6***



Her gotina Rêber Apo... — Gulîstan Xalid — R-3
Brotûsên me jî gewre ne ha...! — Idrîs Henan — R-4
Şingal — Farûk Sakik — R-5
Evîn bi kurdî xweş e! — Sîpan Şînda — R-7

# Pêla çaran ya korona tê

Ciwan Mistefa ji bo belavnebûna pêla çaran ya korona li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê hişyarî da û bang li xelkê kir ku tedbîrên xweparastinê bigirin.



Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Dr. Ciwan Mistefa diyar kir ku pêla çaran ya vîrûsa korona vê dawiyê li welatên cîran belav bûye û got, dibe ku li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê jî belav bibe.

Mistafa teqez kir ku pêla çaran ya vîrûsa korona ji yên berê bixetertir e, herwiha bang li gel kir ku tedbîrên xweparastinê yên pêwîst bigirin.

Di rojên derbasbûyî de, li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê jimara nexweşên korona zêde bû. 26 'ê Tîrmehê jimara pêketiyan gihîşt 29 kesan.

***ANHA***

# Bi merasimekê şehîd Mezlûm Serhed spartin axê

**Şêniyên Qamişlo cenazeyê şervanê YPG'ê Arî Can (Mezlûm Serhed) yê roja Çarşemê di encama qezaya trafîkê de li Hesekê şehîd bûyî, li goristana Şehîd Delîl Sarûxan veşartin.**



Hevalên şehîd, cenazeyê hevriyê xwe hilgirtin û bi durişim û tilîliyên dayîkan ber bi goristana Şehîd Delîl Sarûxan ve çûn.

Merasimê bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir. Hevseroka Meclisa Malbatên Şehîdan Hêvî Seyid sersaxî ji bo malbata şehîd û dayîka wî ku li bakurê Kurdistanê ye xwest û wiha got: "Şehîd Mezlûm nîşan da ku şagirtê rêber Abdullah Ocalan e. Ji bo belavkirina fikir û felsfeya wî dixebitin. Çiqas em behsa têkoşîn û berxwedana şehîd Mezlûm bikin em nikarin mafê wî bidin."

Hêvî diyar kir ku şehîd Mezlûm efsaneyên qehremantiyê raber kirin, da ser şopa şehîdan û beşdarî piraniya pêngavên berxwedanê yên rizgarkirina bakur û rojhilatê Sûriyê bû.

Dayîka şehîd Serhed, Sacîda Can bi telefonê beşdar bû û got, kurê min şehîdê Kurdistanê û ye.

Birayê şehîd, Zana Serhed jî wiha got: "Şehîd Mezlûm wê di dilê me de bimîne, mamoste û hevriyê me bû. Tevî astengiyan têkoşîna xwe berdewam kir û em pê serbilind in."

Zana Serhed di dawiya axaftina xwe de soza şopandina riya şehîdan da û got, bijî Serok Apo, şehîd namirin."


Meclisa Malbatên Şehîdan nasnameya şehîd xwend û radestî malbatê kir.

Hevalên şehîd cenaze bi durişman spartin axê.

***ANHA***

# Li herêma Cizîrê dewreya duduyan ya ezmûnên refa 12`an dest pê kir

**Roja Çarşemê dewreya duduyan ya ezmûnên dawiya salê ya refa 12`an li herêma Cizîrê dest pê kir. Nêzî 2 hezar xwendekarî tev li dewreyê bûn.**



27`ê Hezîrana borî ezmûnên dawiya salê ya refa 12`an (dewreya yekê) bi dawî bûn. Pişt re encama ezmûnan derket û rêjeya xwedenkarên bi ser ketîn ji sedî 63 bû. Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê ji bo alîkariya xwendekaran, dewreyeke din (Tekmîlî) ragihand.

Roja Çarşemê bernameya dewreya duduyan ya ezmûnên refa 12`an li herêma Cizîrê dest pê kir. Li gorî Navenda Ezmûnan ya herêma Cizîrê, jimara xwendekarên tevlî ezmûnên dewreya duduyan (tekmîlî) dibin 2 hezar e.


Ji bo refa 12`an beşa wêjeyî ezmûn ji î28`ê Tîrmehê û heta 4`ê Tebaxê dewam dikin. Ji bo beşa zanistî jî ezmûn ji roja Çarşemê heta 5`ê Tebaxê dewam dikin.

Hêjayî gotinê ye ku cara yekê ye li herêma Cizîrê ev sîstema ezmûnan pêk tê.

3 hezar û 172 xwendekaran li herêma Cizîrê ezmûnên refa 12`an bi dawî kiribû.

***ANHA***

# Ji bo rêber Ocalan li Komîteya Wezîran ya Konseya Ewropa serlêdan hat kirin



**OHD, ÎHD, TÎHV û TOHAV'ê, ji bo ku biryarên Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropa ya binpêkirina mafan ya derbarê Ocalan, Kaytan, Gurban û Boltan de hatîn dayîn, bi lezgînî bixe rojeva xwe, serî li Komîteya Wezîran ya Konseya Ewropayê dan.**

Komeleya Hiqûqnasên ji bo Azadiyê (OHD), Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD), Weqfa Mafê Mirovan ya Tirkiyê (TÎHV) û Weqfa Lêkolînên Hiqûq û Civakê (TOHAV), ji bo ku biryarên Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropa ya binpêkirinên mafan yên derbarê "cezayê girtîgehê yê heta hetayê yê giran" yê ji bo Rêber Abdullah Ocalan, Hayatî Kaytan, Emîn Gurban û Civan Boltan hatîn dayîn, bi lezgînî bixe rojeva xwe serî li Komîteya Wezîran ya Konseya Ewropayê dan.

Di serlêdana ji bo Komîteya Wezîran hatî kirin de, hat diyarkirin ku cezayê mûebeda giran yê li Öcalan, Kaytan, Gurban û Boltan hatî birîn tersê xala 3yan ya Peymana Mafên Mirovan ya Ewropa (DMME) ye û hat xwestin ku vê rewşê bixe rojeva tevayiya civînên xwe.

Di serlêdana ku di asta saziyan de, cara yekê ye ku ji bo Ocalan, Kaytan, Gurban û Boltan tê kirin de, hat diyarkirin ku ligel ku cezayê girtîgehê yê heta hetayê li Ocalan, Kaytan, Gurban û Boltan hatiye birin jî, Komîteya Wezîran ev nexistiye rojeva xwe.

Di serlêdanê de, hat gotin ku 4 rêgezên ku di hiqûqa tirkî de, li gorî ya DMME'yê nayên dîtin hene. Ev rêgez wiha hatin rêzkirin; "Daxistina Hiqûqî ya Ceza", "Di rewşên bixeter de bi dawîkirina ceza", "Girtina ceza li ber çavan" û "Daxistina bi Kiryaran ya Ceza."

**MAFÊ HÊVIYÊ**

Di serlêdanê de, hat ragihandin ku li gorî hiqûqa Tirkiyê, di biryara cezayê mûebedê yê tê dayîn de, şertê ku daxistina hiqûqî yê ceza nînee û ji bo ku "Mafê Hêviyê" bê dayîn divê mekanîzmayeke cuda hebe.

**PÊŞNIYAR**

Di dewama serlêdanê de ev pêşniyar hatin kirin:

"Em dixwazin ev rewşa Ocalan, Gurban, Kaytan û Boltan di rojeva tevayiya civînên heftane û periyodîk yên Komîteyê de cih bigirin.

* Em daxwaz dikin ku Komîte di têkiliyên dîplomatîk yên dualî de pirsgirêka serlêdanê ya têkildar berdewam bike.
* Divê nûnerên endamên komîteyê mijara serîlêdanê jî bixin rojeva xwe û bişopînin.
* Em dixwazin ji Hikumet Tirkiyê Plana Çalakiyê ya derbarê Ocalan de, ji nû ve bê xwestin.
* Li gorî prensîbên ku di darazên DMME'yê de hatine destnîşankirin, divê berdana bi şert ji bo hikumxaran tevan bê cudayî di Zagona Tirkiyê de pêk weke.

***MA***




# *Pêşangeha Şehîd Herekol bi hêviyeke mezin vebû*

Bi durişma "Pirtûk Rehjena Jiyanê Ye", 29ê Tîrmeha 2021ê bi pêşengiya Desteya Çand û Huner ya bakur û rojhilatê Sûrî li Navenda Çand û Huner ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo Pêşangeha Şehîd Herekol ya pirtûkan ya pêcan hat vekirin.

**Hediya HISÊN-Qamişlo**

Ji herêmên bakur û rojhilatê Sûrî bi sedan rewşenbîr, nivîskar, siyasetmedar, endamên saziyên civaka sivîl û bi sedan heskiriyên çand û nivîsê tevlî vekirina pêşangehê bûn. Bi dehan weşanxane bi 130 hezar








pirtûkan tevlî pêşangehê bûn. Herwiha ji bakur û rojhilatê Sûrî, Tûnis, Iraq, Îtalya û bakurê Kurdistanê nivîskar bi pirtûkên xwe tevlî pêşangehê bûn. Di berdewamiya pêşangehê de wê her roj saet 12 û 18an semîner werin dayîn. Mjarên semîneran jî pirrengî ne. Herwiha 3 diyalogên li ser huner, şêwekarî û pirtûkan hene. Pirtûk bi zimanê kurdî, erebî, suryanî, tirkî, ingilîzî û fransî ne. Piraniya pirtûkan çandî, wêjeyî, civakî, siyasî û zanistî ne. Pêşangeha wêneyan jî heye. 44 sazî û weşanxane tevlî pêşangehê bûn. Derbarê mijarê de nivîskar Merwan Berekat diyar kir ku bi 8 pirtûkan tevlî pêşangehê bûye û wiha axivî: "Ev sala 3yan e tevlî pêşangeha Ş. Herekol dibim. Îsal bi 8 pirtûkan tevlî bûme. Pirtûkên min helbest û roman in û bi zimanê kurdî ne. Pirtûkek ji wan jî min tê de gurzek ji stiranên folklorî dane hev û nivîsandine." Berekat got, ez bi tevlîbûna pêşangehê keyfxweş im lê xwezî her 6 heyvan carekê pêşangeke wiha hebûya û hêvî dikim ku pêşangeh were li Efrînê be

Nivîskar Gîvara Xişo jî ku bi 3ê pirtûkan tevlî pêşangehê bûye, da xuyakirin ku sala çaran ne tevlî pêşangehê dibe û pirtûkên wî li ser jiyana şehîdan in. Gîvara da zanîn ku piraniya pirtûkên wî li ser şoreşa Rojava ne û armanca wî nifşên nû û nivîsa dîrokê ye. Gîvara kêfxweşiya xwe anî ziman û da zanîn ku pêşangehên wiha çanda mirovan pêş dixin û zana dikin. Pêşangeh wê heta 5ê Tebaxê dewam bike. Her roj ji saet ji 10ê sibehan heta 10ê êvaran vekirî ye.

# Se´ed Ferso: Hunera kurdî ya resen pêş bixin

**Navenda nûçeyan-Qamişlo**

**Awazên wî bîranînên dîrokî ne, stiranên wî xewnên gelê Kurd in. Bi helbestên Melayê Cizîrî û Cergerxwîn, bi awazên xwe û bi stiranên dengbêjiyê binavûdeng bû. Yek ji stiranên wî ya xelkê pê nas kirî 'Helebce' ye.**



**SE´ED FERSO KÎ YE?**

Hurmend Se´ed Ferso sala 1958'an li gundê Til Erbîd (Mosko El-Sewra) yê bajarê Amûdê yê rojavayê Kurdistanê, ji dayîk bûye. Di malbatek û gundekî hunerî de çavê xwe li dinyayê vedike. Birayê wî û gelek ji gundiyan tembûrvan in. Bavê wî piştgiriya birayê wî dike ku li tembûrê bixe. Se´ed Ferso di nava hest û awazên mûzîkê de mezin dibe. Di 10 saliya wî de birayê wî û hunermend Mihemed Şêxo bi hev re li tembûrê dixin. Bandor lê dibe û pir ji tembûrê hes dike. Ji ber wê birayê wî, wî fêrî tembûrê dike. Hunermed Se´ed Ferso dibêje, dema ez li gund, li Rojava jimara hunermendan pir kêm bû. Yên tên bîra min Seîd Yûsiv, Aram Tîgran, Hiznî û Mihemed Şêxo bûn.

Sala 1979an hunermend Se´ed Ferso dest bi gera xwe ya hunerî dike. Stirana wî ya yekê bi navê 'Xwendin nebe kes naçe pêş' e. Gotin yên nemir Cegerxwîn awaz ya wî ye. Armanc ji gotina stiranê teşwîqkirina gel ya xwandinê ye. Bi destpikirina gotina stiranan, di koma Şuiyan de cih digire. Herwiha 60 stiranên wî hene û gelek kes dibêjin dengê wî weke yê Mihemed Şêxo ye. Ji bo ku em hunermed Se´ed Ferso ji nêz ve nas bikin, me heybeyvînek pê re çêkir. Hevpeyvîn wiha ye:

**Di jiyana hunerî de çi bala te kişand?**

"Jiyana hunerî berfireh e. Stiranên dengbêjiyê bala min kişandin. Lewra ev rengên stiranan ziman pêş dixin. Lê mixabin wê demê kêm hûnermendan ev stiran digotin. Dema niha jî ev rengên stiranan pir kêm in. Bi stiranên wiha xelk dengê me Kurdan dibihîzin. Danasîna gelan bi hunerê ye. Mixabin hunera me ya niha bi partiyan ve hatiye girêdan. Lê divê armanca hunermend dengê gel be; perwerde bike û pêş bixe."

**Di çi zehmetiyan de tu derbas bûyî?**

"Her kesê li Sûrî, -Kurd be ne kurd be- zehmetî kişandiye. Rejima Be´esê ne ji bo gel kar dikir, li ser gel dîktatorî dikir. Gelê Kurd û çanda wî qet qebul nedikir. Dema rêjima dewleteké ne ji bo berjewendiyên gel û welatê xwe kar bike, ew rêjim terorîst e. Ez û gelek kesên hunermend yên ku me bi zimanê xwe stiran digotin, me pir zehmetî dikişand. Ez momoste bûm, ji sê dibistanan bera min dan. Gelek pisgirêk li dibistanê bi min re çêbûn, ji ber wê min dev ji karê mamostetiyê berda. Sala 1995'an min dikana amûrên mûzîkê vekir û heta niha ez lê dixebitim. Ji ber ku stiranên min kurdî bûn, min nikarî wan tomar bikim. Bi giranî me di nava dost û hevalên xwe de digotin."

Hunera kurdî berî şoreşê çawa bû û pişt re çi pêşketin çêbûn?

"Berî şoreşê her kesî nikariya stiranan bêje. Bi giranî yên stiran digotin welatparêz bûn û di nava zor û zehmetiyan de digotin. Lê piştî şoreşê her kesê rahiştî tembûrê bû hunermend. Hunermendên niha xwe bi partiyan ve girê dane. Mixabin em niha nabêjin ev hunermend bi vê stiranê tê naskirin, em dibêjin ev hunermend bi vê partiyê tê naskirin. Bi hezaran hunermendên me çêbûne, lê ne hunermendên welat in, hunermendên partiyekê ne. Hunermendê rast ew e ku li ser êşa gelê xwe dihizire û ji bo azadiya gel ew jî bi stiranên xwe têkoşin dike. Herwiha xweşikbûn û heskirina welat stiranan bi hunermend didin gotin."

# Destar

**Navenda nûçeyan-Qamişlo**

**Destar yek ji amûrên malan yên kevnar e. Dîroka wî di xwe digihîne berî bi hezarê salan. Gelan pê genim dihêra. Li her gundî û li her malê destar amûrekî pir girîng bû.**

**DESTAR JI ÇI ÇÊBÛYE?**

Destar amûrekî ji kevir çêdibe. Dû perçeyên kevir mezin û gulover in,lê yek ji yê din stûrtir e. Kevirê stûr jê re dibjin bingeh. Di kevirê li ser diger re de cihekî piçûk tê kolan da cihê dar çêkin û kesê ku destar bi kar bîne bi hêsanî kevir bigerîne. Kevirê bingeh li erdê ye nayê gerandin. Kevirê din datînin ser û digerînin. Dema tê gerandin genim dihêre. Hem dibe savar hem ard. Herwiha berî ku dest bi hêrana genim were kirin perçeyek qumaş li binî tê raxistin da ku genimê hêrayî bikeve serê.

**ZEHMET E LÊ BI TAM E**

Bêguman destar li her gundî hebû lê jimara wan ne pir bû. Herî zêde 4 destar li gundekî hebûn. Ji ber ku destar giran e, demsala havînê jinên gund li hev kom dibûn, alîkariya hev dikirin û destar bi kar dianîn. Her roj genimê malekê dihêran. Di ber hêranê re jî jinan stiran digotin û suhbet dikirin. Berî ku jin genim bihêrin destpêkê dikelînin, ziwa dikin, paqij dikin û pişt re dihêrin. Destar amûrekî xwezayî ye û tiştê ku pê tê hêran weke genim, nîsk û nok xwezayîbûnê winda nakin. Herî zêde jin destar bi kar tînin. Eger jinan bixwesta ard çêkin hin genim



berdidan çalika destar û hêdî hêdî digerandin. Eger bixwestanan savar çêkin gelek genim berdidan destar û bi lez digerandin. Savarê ku ji destar derdikeve bi bîn û tama xwe keda jinan nîşan dide. Lê di dema me ya niha de ji ber pêşketina amûrên teknîkê, destar hatiye jibîrkirin. Êdî xelkên me hazir dikirin. Bi kurtayî mirov dikare bêje amûr û karê berê li gorî çanda gelan ya xûlikkar û kominal bû. Karê ku civakê bi hev re dikir civakbûn xurt û bihêz dikir.



## Evîn bi kurdî xweş e!

Sîpan Şînda

Erê delala dilê min, dema tu wî fîstanê xwe yê çemçem li ber xwe dikî, wan çavên xwe yên reş û belek kil dikî, wan biskên hinekirî li ser wê eniya xwe de berdidî û li ber deriyê me re diborî, tu dizanî tu goştê laşê min misqal bi misqal dihelînî. Erê delala dilê min, dema bayê biharê li dilê mirovî dide, belekiyên berfê li serê zozanên bilind li ber tîrêjên rojê dihelin û sosin û beybûn didin der û bilbil dest bi helbesta xwe ya ji bo gulê nivîsî dike, wê demê jiyan jî dest pê dike. Erê delala dilê min, dema diya min zarokan dixe mehdikê û lorîkan ji wan re dilorîne û dibêje "Elle delalê/a dilê min, elle" wê demê giyan geş dibin. Û herwiha dema dayîk zaroka xwe ji landikê derdixe û himbêz dike û dibêje "weyla ez gorî delalê/a dilê xwe bim" wê demê gul vedibin. Dema himbêza diya min tê bîra min û ew payîzok û serêliyên wê yên dilbikul li ber guhê min deng vedidin, giyanê min mest dibe û xem û xiyalên min dûr dikevin.

Belê, evîn bi kurdî xweş e hey kezeba min, hey roniya çavê min, hey ruhê min, hey xemrevîna min. Rast e, her ziman cudayiyên wî hene û li axivînerên zikmakî xweş tê. Lêbelê rastiya kurdî û wate û bandora peyv û biwêjên wê yên evînî cuda ne. Dema yek ji zarokên xwe hes dike û wê bi kurdî bi lêv dike, rengê mirovî vedibe, dilê mirovî ter dibe. Hêza peyvê û bandora wê ya li ser giyan û mejiyê mirovî weke bayê evînê pêlbipêl li ser dilê mirovî bide ye. Ew pêlên wî dengî ewqas nerm in û li ber guhê mirovî xweş tên, mirov nikare xwe radestî wan pêlan neke. Hêza wan peyvan weke sêhra evînê ye, di nava dilê mirovî de konê xwe vedide û nema bar dike. Eyn mîna çawa dema bayê evînê li dilê mirovî dide û mirovî sermest û zetim dike…

Belê jiyan bi kurdî xweş e, civat bi kurdî xweş e. Tu wê tama civatên bi Kurdî di zimanên dagîrkeran de nabînî bavê min. Dema civat taq û taq digerin û civat germ dibin, peyvên sêhrbend li binê guhê hev dikevin, wê demê ti tişt nikare tama wê civatê bide. Mirov guhveçîngî dike û li wan peyvên weke bangerê berfê giran guhdarî dike. Dema peyv weke guleyên tifingan li pey hev ji devê pîremêran derdikevin û dibêjin "bayê lê da û bablîsokê hilanî"…

Ma dema evîndar li evîna xwe dike gazî û peyvên evînî li pey hev jê re rêz dike… Dema dibêje "ne te dil û hinavê min peritandin", "ne ez ji derdê evîna te bûm gurek har û dîn û li çolan ketim", yan jî "te ez helandim kirime komek hestî"….

Ax evîna min, hey sebra dilê min, hey roniya çavê min, ax kul û kesera li ser dilê min, mal û milkê min, ax şîrîna li ber dilê min… Belê, zimanê kurdî ji nava dilê evînê tê, nerm e, helîm e, nazik e.

Bi Xwedê kim nifir û dijûn jî bi kurdî xweş in. Dema dibêjin, "hey penceşera nêr û mê tu girtî", "kuro hey belqitiyo", "rebî ne li vê dinê ne li wê dinê tu bi miradê xwe nekevî", "rebî tu li ser gû de bimirî"…

Belê delalê dilê min, dema tu wê guliya xwe dişkinî û li ser eniya xwe ya kever de berdidî û li ber deriyê mala bavê min keçikê re diborî, gelo tu dizanî tu cerg û dilê min dihelînî û xewên şevan li min diherimînî!

# Beşên nû li qonaxa amadeyiyê zêde dibin

Bi armanca teşwîqkirina perwerdeya pîşesaziyê û pîşeyî, Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Rêveberiya Xweser ya Herêma Cizîrê îsal amadekariya zêdekirina şaxên nû li qonaxa amadeyiyê dike.

Çandinî, pîşesazî û bazirganî bingehên sereke yên aborî û stûna pêşketina wê di cîhanê de ne. li ser vî esasî, desteya perwerdeyê wê îsal girîngiyeke taybet bide van şaxan.
Vekirina şaxên nû li qonaxa amadeyî û pêşxistina wan serkeftinek e û li rêzedestkeftiyên ku Rêveberiya Xweser di qada perwerdeyê de pêk anîne, zêde dibe.
Hevserokê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Herêma Cizîrê Mihemed Salih Ebdo diyar kir ku wê îsal şaxên nû weke "Pîşesazî, bazirganî, çandinî û tenduristiyê" vekin. Herwiha planên vekirina petrol û beyterî jî di qonaxa amadeyî de dikin.
Desteya Perwerdê ya Herêma Cizîrê wê 19 dibistanên qonaxa amadeyî veke. Deste wê dibistanên pîşesaziyê li Dêrikê, Til Koçer, Tirbespiyê, Amûdê, Dirbêsiyê, Til Temir û Hesekê veke. Amadeyiya tenduristiyê û çandiniyê jî li Qamişlo û Hesekê veke. Amadeyiya bazirganiyê li Qamişloyê, Hesekê û Girkê Legê veke. Amadeyiya beytarî li Hesekê veke. Amadeyiya petrolê jî wê li Rimêlanê veke. Herwiha peymangeha pîşesaziyê jî wê were vekirin û dema xwendina wê jî wê du sal bin.
Beşên van amadeyiyan hene,



amadeyiya pîşesaziyê ji pîşeya pêk tê "Mîkanîk, îlktronîk, torno, Informatîk, xerat, neçar û kehrebe". Amadeyiya çandiniyê jî ji du beşan pêk tê; beşa çandiniyê ya giştî ya ji bo zêdebûna tov û beşa duduyan jî wê tê de li ser alavên çandiniyê perwerde werin dîtin.
Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Herêma Cizîrê sala 2017`an cara yekê qonaxa amadeyî ya pîşesaziyê vekir, ku berê hikumeta Şamê ev beş paşguh kiribû. Xwendekarên îsal di qonaxa amadeyî de bi ser ketin, wê peymangeha pîşesaziyê bixwînin.
Mihemed Ebdo da zanîn ku desteyê komîteya şopandina van amadeyiyan ava kir û wiha got: "Binesaziya van amadeyiyan xirab bûye û pêwîstî bi sererastkirinê heye, herwiha pêwîstiya amadeyiyan bi alavên pîşeyî heye û emê wan peyda bikin."
Desteya Perwerde û Fêrkirinê komîteya amadekirina meteryalên taybet bi van amadeyiyan ji bo zimanên kurdî û erebî ava kir û wê beriya sala xwendinê ya 2021-2022`an dest pê bike, van metiryalan amade bike.

Endamê komîteya amadekar Îbrahîm Ereb têkildarî mijarê wiha got: "Niha pispor meteryalan bi awayekî akademîk amade dikin. Di heman demê de komîte meteryalan werdigerînin zimanê kurdî da ku her gel bi zimanê xwe perwerde bibe."
Ereb da zanîn ku xwendekarên ku îsal qonaxa perwerdeyê ya sereke bi dawî kirin, wê li gorî rêjeya ku komîteya amadekar a Desteya Perwerde û Fêrkirinê diyar kiriye, li beşên amadeyiyên pîşeyî û pîşesazî werin belavkirin.
Deste di sîstema xwe ya perwerdê de xwe dispêre nirxandina kar û xebata xwendekaran, herwiha tevlêbûna xwendekar a ji waneyan re û girêdana bi hatine dibistanê re û reftar jî di ber çavan re tê derbaskirin. Bi gotineke din nirxandina xwendekaran ne tenê li ser esasê ezmûnên dawî tê kirin.
Derbarê mijarê de Mihemed Salih Ebdo wiha got: "Îsal dê mamosteyên pispor çavdêriya xwendina xwendekaran bikin, xebata xwendekaran a sala xwendinê ji sedî 50 ji encama dawî tê hesibandin û ji sedî 50 li gorî ezmûna nivîskî ya dawî ye. Em amade ne sîstema xwendinê bi pêş bixin û diyarkirina çarenûsa xwendekarên xwe li ser bingeha binketin û serkeftina di ezmûnên kilasîk de red dikin."
Ereb diyar kir ku piştî qonaxa amadehî ya sê salan bi dawî bibe, peymangehên taybet hene û dema xwendina wan jî ji du heta sê salan e, her wiha amadekariyên vekirina zanîngehan jî tê kirin û dema xwendina wan jî 5 sal in.
Ereb da xuyakirin kir ku dema xwendekar ji qonaxa amadeyî derkevin, dikarin li gorî xwendin û beşa xwe bixebitin, di heman demê de ger bixwazin, dikarin xwendina xwe li peymangeh û zanîngehan jî berdewam bikin.
Hevserokê Desteya Perwerde û Fêrkirinê Mihemed Salih Ebdo wiha dawî li gotina xwe anî: "Em hewl didin kadroyên zana û pîşeyî ava bigihînin da ku xizmeta welatê xwe bikin. Rêveberiya Xweser biryar da ku dema ew xwendekar xwendina xwe bi dawî bikin, yekser bixebitin."
Desteya Perwerde û Fêrkirinê biryarnameyek ragihand ku pêwîstî bi mamosteyên pispor ên qonaxa amadeyiya pîşeyî ku wê vebin, heye. Herwiha endamê Komîteya Perwerdê Mihemed Ereb got pêwîstiya wan jî bi endazyar û pîşezan heye. Piştî ragihandina vê biryarnameyê heta niha zêdetirî 600 mamosteyan navên xwe tomar kirine.
***ANHA***

# ´Bila jin li pey xeyalên xwe herin´

Havva Aksal ya 46 salî debara xwe bi dikana sebze û mêwe dike. Havvaya ku di heman demê de beşa Îlahiyatê ya Zanîngehê dixwîne wiha dibêje: "Divê jin xwe ji rolên hişmendiya civaka serdest ya mêr rizgar bike û di riya xwe de bimeşe. Bila jin li pey xeyalên xwe herin."
Jinên ku pêşengiya jiyanê dikin di her qada jiyanê de rengên xwe nîşan didin. Havva Aksal (46) ya ku li Pîrana Amedê dijî û debara xwe bi dikana sebze û mêwe dike jî di qada aboriyê de rengê xwe nîşan dide. Havvaya ku 5 sal in vî karî dike dibêje, divê jin bikare bêje ez dikarim bikim û ez dikim.



**'Êdî karekî jin nikaribe bike nîne'**

Havvayê di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser karê xwe û wiha axivî: "Min û amojina xwe dixwest di karekî de bixebitin û me ev cih dît. Me wisa dest pê kir. Destpêkê me ji bazirganiyê fêm nedikir. Lewra em her tim di mal de bûn. Lê bi demê re êdî me jê fêm kir û me xwe pêş xist. Êdî karekî ku jin nikaribe bike hema hema nîne. Destpêkê li dijî karê min nêrîneke baş tinebû. Lewra karê dikana sebze û mêwe her tim bi çavekî karê mêran e hatiye dîtin. Lê bi demê re êdî çavên wan jî hînî karê min bûn."

**'Ji aliyê jinan ve gelek gavên girîng hatine avêtin'**

Havvayê diyar kir ku her tim di nava xebat û tevgerê de bûye û wiha pê de çû: "Gava min ev kar nedikir, dîsa di hundirê mala xwe de min salçe çêdikir û difirot, sebze û fêkî kom dikir û difirot yan jî hişk dikir û firotina wan dikir. Dîsa ji berê de diya min salçe çêdikir û difirot şîr, pênîr difirot. Yan jî min berhemên baxçe kom dikirin û bazara wan dikir. Kedeke mezin me dida. Îro beramberî heqdestê me li gorî demên ewilî baştir xuya dike. Ji bo aboriya serbixwe ji aliyê jinan ve gelek gavên girîng hatine avêtin.

**'Bawerî û cesareta me bi xwe heye'**

Havvayê li ser zehmetiyên karê xwe jî sekinî û wiha got:"Em hê jî di karên xwe de hin zehmetiyan dikşînin. Wekî girtina zebzeyan yan jî di karên teknîkî de zehmetî çêdibin. Lê bawerî û cesareta me bi xwe heye ku emê xwe pêş bixin. Gava jin ji bo destpêkê gavê biavêje dibîne ka çiqas rê derbas dike. Divê jin bikare bêje ez dikarim bikim û ez dikim. Xebata jinê bi rengê jinê xweştir e."

**'Bila jin li pey xeyalên xwe herin'**

Havvayê di dawiya axaftina xwe de da zanîn wê ti carî nexwestiye di malê de tenê bimîne û wiha got: "Min ti carî nexwest di hundirê malê de tenê rûnim, firaq û cilan bişûm. Divê her tim di vê jiyanê de miro cihê xwe bigire û li pey jiyaneke biwate be. Ez 46 salî me lê xwendevan im. Dibe ku hinek dereng mabim lê min daxwaziyeke xwe pêk anî. Li gorî min divê hemû jin cesareta xwe bigirin û li pey daxwazî û xeyalên xwe herin. Bi taybetî jî di aliye xwendin û aboriya serbixwe de divê jin her tim pêşengiyê bikin."
***JINNEWS***

# 'UNICEF ji planên dewleta tirkî û hikumeta Şamê re xizmetê dike'

**Endamê Rêveber yê Komîteya Avê ya Herêma Efrînê Seydo Seydo diyar kir ku siyaseta UNICEF`ê xizmeta ajandeyên Tirkiyê û çeteyên wê û hikumeta Şamê dike û got, eger rêxistina cîhanê biryarên xwe di ber çavan re derbas neke, planeke demkî ji bo çareseriya avê heye.**



Welatiyên herêma Efrînê li rex topbarana artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê, zehmetiyên ambargoya li ser kantonê û kêmbûna ava vexwarinê dikişînin.
Rêxistina UNICEF ya Cîhanê ji 11`ê Tîrmehê ve miqdara ava ku dida kantona Şehba kêmî nêvî kir. Di encamê de gelek gund û navçeyên ku koçberên Efrînê lê bi cih bûne ji ava vexwarinê bêpar man. Berî wê rêxistinê rojane ji 2 hezar û 400 metrekab av heta hezar metrekabî dida kantonê.
Endamê Rêveberiya Komîteya Avê ya Herêma Efrînê Seydo Seydo diyar kir ku bîrên li kantonê ku jimara wan deh e, têra welatiyan nakin.
Seydo ev li gotina xwe zêde kir: "Piştî koçberkirinê, welatiyên Efrînê malên wêrankirî û kamp kirin devera berdewamkirina berxwedana xwe, lê ev berxwedan û hevgirtina welatiyan ne li gorî berjewendiyên dagîrkeriya tirkî û hikumeta Şamê bû. Ji ber wê xwestin bi êriş û topbarana rojane berxwedanê lawaz bikin. Hikumeta Şamê jî ambargo danî ser welatiyan da tiştek derbasî kantonê neb."
Têkildarî kêmkirina avê ji aliyê UNICEF`ê ve Seydo wiha got: "UNICEF ku dibêje, ez parastina mirovayiyê diki, em matmayî kirin, 11`ê Tîrmehê ku pileya germê pir bilind bû miqdara avê kêmî nêvî kir. Hincetên wê jî bê bingeh in ew e ku êdî nema dikare lêçûna gihandina avê bide û peymana ku li gorî wê avê dide herêmê bi dawî bûye. Li ser vê yekê av li ser gelek gundan, di nav de navçeyên Ehdasê, Til Rifetê, gundên Maratê, Til Qerah û gelek deverên din qut bû."
Piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve, UNICEF di buhara 2018'an de peymanek îmze kir. Li gorî vê peymanê dê rojane 2 hezar û 400 metrekab bi sehrîcên ku li Helebê bên dagirtin bide kantonê.
Endamê Rêveber yê Komîteyê Avê bal kişand ser siyaseta li ser herêmê tê meşandin û wiha got: "Siyasetên ku Tirkiye û çeteyên wê, hikumeta Şamê û UNICEF`ê demeşînin planeke berfireh e. Armanc jê berxwedana welatiyan lawaz bike û careke din wan bide koçberkirin."
Seydo got, eger UNICEF ji ser biryara xwe vegere û miqdara avê wekîe berê nede, emê bîrên nû li navçe û gundên kantona Şehbayê bikolin da ku avê ji welatiyan re peyda bikin.
Endamê Rêveber yê Komîteya Avê ya Herêma Efrînê Seydo Seydo di dawiyê de wiha got: "Plan û siyaseta li dijî welatiyên herêma Efrînê tê meşandin wê bin bikeve û wê nikaribin welatiyan dûrî berxwedanê bixin, armanca me ya sereke rizgarkirina Efrînê û veger e.
***ANHA***



# Pergala Rêber Apo bû roniya riya azadiya jinên Êzîdî

Êrişên DAIŞ'ê yên li ser Şingalê fermana 73'an ya li hemberî civaka Êzîdê bû. Bi hezaran zarok, jin, zilam, kal, pîr hatin kuştin; 5 hezar jin jî hatin revandin û li sûkan hatin firotin. Caziya diyar kir ku, wê hesabê vê fermanê ji sûcdaran bê xwastin.

**Dilîn EHMED-Qamişlo**

3'yê Tebaxa 2014'an hêzên hikûmeta başûrê Kurdistanê yên qaşo parastina herêmê dikirin xwe ji Şingalê kişandin û DAIŞ'ê êriş kir. Bi hezaran jin, zarok, mêr kalûpîr bi destê çeteyên DAIŞ`ê hatin kuştin û zêdeyî 5 hezarî jinên Êzîdî hatin revandin. Armanca çeteyan û hêzên wek dewleta tirkî ya dagîrker ku piştgirî didan çeteya ji wê êriş û komkujiyê ew bû ku, civaka Êzîdî tine bikin.
Piştî ku çeteyan êrişî şingalê kir, ji bo parastina gel hêzên gerîla û YPJ/YPG'ê berê xwe dan çol û çiyayayên Şingalê. Şervanan bi têkoşîneke bêhempa bi sedhezaran malbatên Êzîdî, ji komkujî û qirkirinê xilas kirin û gihandin cihên ewle. Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê jî, li bajarê



Dêrikê ji bo pêşwaziya koçberan, bi navê Newroz kampek ava kir. Piştî rizgarkirina Şingalê ji aliyê şervanan ve gel doza vegerê kir.





**`Jinan bi berxwedana xwe armanca dijmin têk bir`**

Derheqê mijarê de rêvebera Sîwana Meclisa Jinên Êzîdî Caziya Hewran, bi pêmana salvegerê komkujiya 2014`an ya ser gelê Şingalê şermezar kir û ji malbatên şehîdan re sersaxî xwest. Caziya herwiha ji bo kesên wenda bi taybetî jinên ji aliyê çeteyan ve hatîn revandin, hêviya rizgariya wan kir. Caziya Hewran axaftina xwe wiha domand: "Heta ruh di canê me de hebe emê êşa civaka xwe ji bîr nekin. Heta mirovek Êzîdî li ser rûyê diyayê hebe, ji ser doza vê civaka ewqas neheqî lê dibe wê venegere. Bi taybetî jin. Divê jinên me tola xwe ji dijmin re nehêlin û heta dawiyê li ber xwe bidin. Çawa niha bi berxwedana xwe armanca dijmin têk dibin, divê bi heman ruhî têkoşîna xwe xurttir bikin."

**`Koka gelê Kurd civaka Êzîdî ye`**

Caziya Hewran got, tevî zor û zehmetiyan jî gelê Şingalê ji bo parastina çanda civakê, xwe birêxistin kir. Bi taybetî jina ku bûbû armanca dijmin û wiha berdewamî da gotinên xwe: "Jinên ku dijmin ew ji xwe re kiribûn armanc, bi saya fikir û felsefeya tevgera azadiyê îro di qada leşkerî, siyasî, civakî û çandî de, bûne pêşeng. Ew jinên ku çeteyên DAIŞ`ê dixwestin vîna wan bişkînin, îro bûne pêşengên civakê. Emê bi vê coşê doza mafê xwe li cîhanê bikin. Çawa hêzên navneteweyî tev li me bûn yek û ev komkujî pêk anîn, emê jî heta hetayê li ber deriyê rêxistin û saziyên qaşo mafê mirovan d iparêzin, çalakiyên xwe li dar bixin.
Endama Sîwana Meclisa Jinên Êzîdî Caziya Hewran di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Banga min ji gelê Kurd re ew e ku, mafê civaka Êzîdî biparêzin, lewra koka gelê Kurd, civaka Êzîdî ye. Planên ku dijmin li ser civaka Êzîdî dimeşîne, li ser gelê Kurd û tevayiya gelên azadîxwaz e."

# `Li hêviya ti kesî nemînin, berxwedana xwe xurt bikin`

**Navenda nûçeyan-Qamişlo**

**Ji 23`yê Nîsanê ve li Zap, Avaşîn û Metîna, ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker gerîla bi têkoşîneke bêhempa li ber xwe didin. Li ser mijarê Leyal Gulo got, dewleta tirkî, êrişî sivîlan dike û keda wan ya salan talan dike.**

Li dijî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser Zap, Avaşîn û Metîna yên ser Herêmên Parastinê yên Medyayê, gelê Kurd li seranserê cîhanê çalakiyan li dar dixe û nerazîbûna xwe nîşan dide. Derheqê mijarê de dayîka du şehîdan Leyla Gulo diyar kir ku, piştî berxwedana gel û bi saya şehîdan, niha li ser xaka xwe bi awayekî azad dijîn. Herwiha da zanin ku ji ber ku siyasete dewleta tirkî li ser dagîrkeriyê hatiye avakirin û li dijî mirovayiyê şer dike, dixwaze gelê Kurd qir bike û destkeftiyên wan dagîr bike.



**`Plan qirkirina gel e, ne partî û kesayet in`**

Leyla Gulo axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî dibêje ez şerê teroristan dikim, lê cîhan giş dibine ku ew bixwe terorîst e û şerê xwediyê xakê dike. Dewleta tirkî ya faşîst li ber çavê cîhanê, bajarên me Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Sipî dagîr kirin. Rastiyeke li ber çavan e, Erdogan dixwaze cîhanê bi hişmendiya DAIŞ'ê dagîr bike. Çeteyên mîna DAIŞ`ê bi rêxistin dike û wan dişîne ser xaka me. Armanca dewleta tirkî ne rêxistin û kesayet in, plana wê qirkirina gelê Kurd e."
Leyla da xuyakirin ku niha gelê Kurd di rojên pir dîrokî re derbas dibe, lê ji ber ku dewleta tirkî dewleteke dagîrker e, Kurd li kû bin êrişî wan dike. Leyla wiha dirêjayî da axaftina xwe: "Ji berê ve Erdogan dibêje `Kurd li ser heyvê bin jî, ezê şerê wan bikim. Ez nahêlim bibin xwedîmaf û xwedîziman.` Bi êrişên ser Zap, Avaşîn û Metîna, ev diyar bû. Ji ber wê divê gelê me hişyar be û baş bizane ku dewleta tirkî bi hiceta PKKê êrişî hebûna wan dike."

**Gelo xweza jî terorist e?**

Leyla got, dewleta tirkî bi tang û topên xwe bi çekên qedexekirî, zarokên me şehîd dixe û dar û çiyayên me tevan dişewitîne, gelo xweza jî terorist e? Di zagon û olan de qedexe ye ku mirov xwezaya civakê xirab bike. Çima cîhan tev li hemberî sûcên ku dewleta tirkî derheqê me Kurdan de dike bêdeng maye? Banga me ji dinyayê û rêxistinên mafên mirovan re ew e ku, çav û guhê xwe vekin. Ti kes nikare inkar bike ku em Kurd xwediyên dîrok û çandeke kevnar in. Ma wê heta kengê welatê me bindest be? Mafê me jî heye em bi ziman û çanda xwe li ser xaka xwe azad bijîn."
Leyla Gulo bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Em malbatên şehîdan heta dawiyê emê li ser şopa şehîdên xwe bin. Lewra em xwediyên vî welatî ne. Gelê Kurd ne gelekî biyanî ye û nehatiye xaka civakekê dagîr nekiriye. Kurd xwediyên Kurdistanê ne. Dijmin çi dike bila bike, em ti carî serê xwe natewînin, lewra em ji xwe bawer in. Banga me ji bo tevayiya gelê Kurd re ew e ku têkoşîna xwe bi ruhê şehîdan xurt bikin. Herwiha divê gel li hêviya ti kesî nemînin ku mafê wî biparêze. Lewra plan û êrişên ku tên kirin, bi erêkirina hêzên navneteweyî ne. Her yek ji wan ji bo berjewendiyên xwe plana li ser me dide meşandin. Ji bo wê ya herî girîng û pêwîst, xurtkirina berxwedanê ye."

## Di her gotina Rêber Apo de ilmek, keşfek




**Gulîstan Xalid**

Mirov çiqas xwe rast pênse bike ewqes di ferqa xwe de dibe û ewqes dikare guhertinan di jiyana xwe û ya derdora xwe de çêke. Xwerastpênasekirin jî zanebûneke derheqê dîrok û şêwazê mezinkirina xwe de em çiqas pêş bixin ewqes dikarin azad bibin ewqes dikarin xwezayî bibin. Hin gotin ji xwe ve nehatine gotin, dema li ser wan gotinan baş biponijin em dighîjin ilmekî, zanistekê, keşfekê. Vêca dema ev gotin ji devê kesên ku baş di meseleyên azadiyê de têgihiştî bin nirxeke xwe hê zêdetir heye. Gotina Rêber Apo ku dibêje "em di destpêka dîrokê de û dîrok jî di roja me ya îro de ye" balê dikşîne ser rastiya zindîbûna dîrokê û nakokiyên ku îro ji ber rastiya jiyana ku sîstema desthilatdar bi ser civakan d sepandiye radixe ber çavan. Bi gotineke din ya Rêber Apo em dikarin vê hê baştir şîrove bikin" jiyana şaş rast nayê jiyan kirin- hûn şaş mezin bûne". Bi vê gotinê re jî me dixe nava gera li çavkaniyên pirsgirêkên azadiyê ya ku em di roja îro de di gelek aliyan de jiyan dikin.
Pirsgirêkên azadiyê, xwebûnê, exlaqî û polîtîk hwd. Gelek pirsgirêkan em dikarin rêz bikin û li sedemên wê bigerin. Wek mirovatî me li kû derê wenda kiriye û di çi de wenda kiriye. Bi hîskirina rastiyan yan jî ya rast çi ye dema ku di her kêliyê de, di raberkirina helwest û tevgereke me de xwe teyisand wê demê em têgihiştî dibin û di ferqa lêgerên xwe yên azadiyê de dibin. "Yê şer dike xweşik dibe, yê xweşik dibe azad dibe, yê azad dibe tê heskirin". Ji bo ku em hes bikin û bên heskirin pêwîst nake em li dûr bigerin, em li xwe bigerin û xwe ji qefesên ku me ji me dûr xistiye rizgar bikin. Em bi wê qefesê re dema şer bikin û deriyê wê qefesê bişkînin em xwe bibînin, wê demê emê azad bibin û bêne heskirin. Yanî ez dixwazim bêjim ku gelek gotinên Rêber Apo yê ku em wateyên pir binirx û bifayde jê derxin hene. Em wan gotinan tenê nebêjin û derbas nekin. Di her gotineke Rêber Apo de ilmek, keşfeke ya ku mirov nêzîkî heqîqetê bike heye.
Dibe yên xweşik û azad jî her dem neyên heskirin yan qebûlkirin. Ji ber yê xweşik û azad tenê ji aliyê kesên ku li xweşikbûnê û azadiyê digerin tên hezkirin. Lê jixwe ev daxwazî û gera piraniyan mirovan e. Eger îro Rêber Apo ji aliyê bi milyonan mirov-gelan ve tê qebûlkirin û heskirin sedema wê ew e ku Rêber Apo bû dengê di dil û mejiyê me de. Bû gotinên ku di hundirê me de, bû heqîqeta me ya wendayî. Ji lewma em li vê felsefeya Rêber Apo xwedî derkevin û bi jiyanî bikin, ev şertê xilasiya me û azadiya Rêber Apo ya fîzîkî ye.

# Dema şerê gel yê şoreşgerî ye

‘Eger hêza me ya binxistina cîhanê tevê hebe jî emê êriş nekin. Lê eger cîhan tev bibe yek û êrişî me bike, emê li ber xwe bidin.’



**Rêber APO**

Weke gel û civak em di pêvajoyeke dijwar de dijîn. Dibe ku her kes bêje ji xwe her tim ev şer hebû. Rast e jî. Ev çil sal in em di nava şer de dijîn. Em di nava rastiya şer de, li pey şopa heqîqetê ne û têkoşîna azadiyê dikin. Lê divê were dîtin ku ev pêvajoya heyî ya niha em tê de dijîn ji her demê zehmettir û dijwartir e.

Binêrin, li çar aliyên Kurdistanê ji aliyê hêzên heremî û cîhanî ve êrişeke pir dijwar li ser nirxên me yên netewî û çandî heye. Ango bi giştî mirov dikare bêje ku êrişeke mezin ya di dîrokê de nehatî dîtin li ser hebûna me heye. Dema mirov bi taybetî li vê pêvajoyê binêre, wê bibîne ka çiqas polîtîkayên qirêj û gemar li ser Kurdistanê tên meşandin. Ji ber wê ev gotina rêbertiyê ya me pê dest bi nivîsê kirî, bi awayekî herî zelal rastiya me ya weke gel em tê de dijîn pênase dike. Hêzên heremî û cîhanî yên ku nakokiyên mezin di nava wan de hene, dema mijar dibe gelê Kurd û têkoşîna wî ya azadiyê, li hev kom dibin û dibin yek. Ev herî dawiyê di komcivîna NATO de pir eşkere xuya bû. Ji ber wê divê em Kurd êdî di ferqa hebûna xwe de bin. Êdî divê em bibînin ku ji bilî me hêzeke me biparêze nîne.

Dema em ji dayîk bûn, me her rengê êrişên faşîzmê bi çavê xwe dît. Lêdana dêbavên me li ber çavê me ji cendirmeyên faşîst yên Tirk xwarîn, hê jî li ber çavê me ye. Hestiyên nirxên me yên ku li ber çavê dijmin dibe tirs û xofeke mezin û nadin malbatan, hê li bîra me ne. Gelek ji me êşên mezin yên faşîzmê anîn serê me, me bi çavê xwe dîtine. Lê digel van ev bêdengiya heyî ya niha pênaseya çi ye gelo? Heta kengê emê ji êrişên li ser erdê xwe re bêjin ‘ser çavan’? Em di nava rastiyeke herî dijwar de dijîn. Ew jî ew e ku çawa li Agirî bi tepisandina berxwedanê li ser çiyayên me hat nivîsîn ku ‘Kurdistana xeyalî li vir veşartî ye’; niha jî dixwazin serhildan û berxwedana PKK’ê ya ji bo tolhildana sedê salan ya gelê Kurd li çiyayên azad careke din bitepisînin û xeyalên azadiyê bi dawî bikin. Lê Rêber APO jî dema PKK’ê pênase dike dibêje ‘Ez PKK’ê nas dikim, bin nakeve’. Hêzeke cîhanî nîne ku bikare îradeya ji pola ya PKK’ê ya bi felsefe û bîrdoziya Rêber APO hatî avakirin û bi biryardarî û girêdana şehîdan xwe ava kirî têk bibe. PKK’ê mafdariya xwe ji heqbûna xwe digire. Ji ber wê niha gerîlayên li çiyayên azad li ber xwe didin bi vî ruhê û bi vê hişmendiya ku ti caran naşke têkoşîneke bêhempa dike. Ev têkoşîn jî li hemberî tinebûna ku faşîzm bi ser me de disepîne, şerê hebûn û azadiyê ye.

Niha li çiyayên azad, li ser erdê pîroz yê ku di dîrokê de her tim gelê Kurd pişta xwe dayiyê, gerîlayên azadiya Kurdistanê di nava berxwedanekê mezin de ne. Li dijî dagîrkerî û faşîzmê şerê hebûnê dikin. Bi vê berxwedana xwe parastina gelekî, parastina rûmeta gelekî dikin. Lê divê bi taybetî jî di vê pêvajoyê de berxwedana gerîla tenê nemine. Gerîla li çiyayên azad li ber xwe dide û wê her tim jî li ber xwe bide. Lê rastiyek heye ku di vê serdemê de tişta ku me bibe serkeftinê Şerê Gel yê Şoreşgerî ye. Encax bi pêkanîn û bi bicihanîna erkên şerê gel yê şoreşgerî em bikarin erkê xwe ya dîrokî pêk bînin. Bi vê hişmendî, bîr û baweriyê wê serkeftin teqez bibe ya jin û gelên azadîxwaz.

FENER



## Brotûsên me jî gewre ne ha…!

**Idrîs HENAN**

Maka hemû gendeliyan xiyaneta bi nirxan re ye. Ji lewra pêwîst e xeta tasfiyekar bê zeftkirin ku gendelî ji kokê ve ziwa bibe. Heta ku êrişên ser nirxan hebin, gendelî û fesadî bi reh û damar dibin. Ancax bi zanebûneke dîrokî em bikarin rê li ber van cureyên fesadiyê yên xwe spartine xeta xiyanetê, bigirin. Derveyî vê rêbazê, şerê li hemberî aşê bayê gendeliyan û di selika fesadan de hêkkirin e.

Xiyanet yek ji wan rewşên beloq û roxîner ji têkîliya mirovî re ye. Ji têkîliyeke dukesî heta pirkesî jî çêdibe. Ji destpêka dîrokê ve weke xeteke parelel li dijî wefedariyê meşiyaye. Yek ji sedemên sereke yên şer, pevçûn û roxandina dewlet, imperetorî û jinavbirina civakan e. Kesên wî karî dikin dixwazin ferd yan kom be, di encamê de ji derveyî çermê xwe derdikevin û bi awayekî nepenî yan eşkere, ji bo hinek pere, peywir û xulamtiyan bi dijminan re dikevin nava hevkariyê. Lê çawa dîrokê derketina wan vegotiye, herwiha taliya wan jî baş gotiye; dîrok dibêje: Çiqas xeta xiyanetê temendirêj be, dawiya wê ya tekûz jî trajîk e.


Kesên han ku derveyî rêûresmên civaka exlaqû û polîtîk derketine û di eniyên dijmin de cih girtine, di serî de xwe didin iqnakirin û bi dunyaya xwe ya nû re hevjiyaneke li ser esasê berjewendîparêz didin avakirin. Her di wê baweriyê de ne ka çiqas nirxên civakê yên resen binpê bikin, ewqas wêrek û zîrek in.

Di bingehê xiyaneta navxweyî de otoasîmîlasyon heye. Ango li dijî çanda xwe şerkirin û xwedayîna ber kêra kujerên qirker yên çanda bav û kalan e. Dîrokê navên bi dehan şah, mîr, zanyar, olnas, wezîr, general, rewşenbîr, ramyar, serok û şêwirmendên kurtêlxwer tomar kiriye. Hemû kes û aliyên ku ew kar laiqî xwe dîtine xwedî heman xisletê ne; nezan, kor û tirsonek in. Di hembêza desthilatdariyê de derûniya xwe ava kirine û teslîmî wê bûne. Zelalbûn û cewherê xwe yê gerdûnbûyînê ji dest dane. Cehaleteke xeternak ya azadiyê red dike dijîn. Heqîqetan berûvajî dikin û hewl didin derdorê bi xwe bidin bawerkirin. Di koka wan de xisletên dewletdarî barkirî ne. Biyaniyên dîroka heqîqet û welêt in. Bi gotineke hê zelaltir û rasterast; kesin di cewherê xwe de bêesil in. Ji lewra zanista dîrokî xwedî wê girîngiyê ye ku sererastkirina heqîqetên hatine berûvajîkirin e. Rêberê gelên Kurdistanê Ocalan dibêje: “Dîrok pêşeroj û paşerojê di vê kêliyê de anîna li gel hev e”. Dema em li gorî vê rêgeza felsefîk bimeşin û rewşa îro binirxînin, emê bibînin ku xiyanetkarên îro ne dûrî Bekoyê Ewan, Bedlîsî û Brotûsê ku destûr da rijandina xwîna Julius Sezar in. Gelo kesên ku îro li çiyayên Kurdistanê şehîd dikevin, ma ne bi destê ewantiya Beko û Brotûsên serdema nûjen in? Ma tişta îro diqewime ne gelhevbûna pêşeroj û paşeroja xeta xiyaneta Kurd e? Dijminê Kurdan herwisa kirine ku piştî têkçûna li hemberî berxwedana Kurdan, berê xwe didin barhilgêrên erzan yên belaş. Îro jî li Kurdistanê ew xet çalak bûye û li başûrê welêt serwer bûye ku xwe weke daneheveke desthilatdariyê li ser singê civakê daye rûniştandin. Daneheveke tijç gendelî ya bênirx e. Bi feraseta tasfiyekar, weke Brotûs; ji bo ‘Romaya Gewre’ bê şerm pêşengiyê ji neyarên Kurdan re dikin. Eger ev ne cewherê gendelî û fesadiya ku diajo xiyaneta mezin be, wê çaxê mirov dikare çi navî lê bike gelo?

## ‘Qebûlnekirina statûya Rêveberiya Xweser nakokî ye’

**Navenda nûçeyan/Qamişlo**

**21`ê Çileya 2014an li rojavayê Kurdistanê Rêveberiya Xweser hat ragihandin. Lê heta niha ji aliyê dewletan ve bi fermî nehatiyê qebûlkirin. Berî niha ji bo qebûlkirina Rêveberiya Xweser li ser tora civakî kampanyayek li ser asta cîhanê hat destpêkirin û ket rêza 3’yan.**




Têkildarî mijarê nivîskar Ebdulhelîm Ehmed Lawî bal kişand ser rola Rêveberiyê Xweser ya di şoreşa rojavayê Kurdistanê de û got, ji dema ragihandina rêveberiyê ve gelek kar û xebat li Rojava kirine û her ku diçe keda vê rêveberiyê li Rojava pirtir dibe. Herwiha gelek sazî û rêxistinên Rêveberiya Xweser li Rojava hatine avakirin. Ev sazî jî bi keda şehîdan û bi berxwedana gelê herêmê heta niha li ser kar in. Li bakur û rojhilatê Sûriê heta niha ser 11 hezarî re şehîd çêbûne. Her ku diçe ev rêveberî li cîhanê baştir tê naskirin. Tevî ku demeke kurt e rêveberî hatî avakirin, lê di van çend salan de xwe nîşan da. Ji bo wê jî divê xweseriya wê bi awayekî fermî were qebûlkirin. Ku wisa bibe wê aloziya li Sûriyê jî zûtir were çareserkirin.

Ebdulhelîm behsa kampanya haştag ya ji bo naskirina Rêveberiya Xweser kir û wiha got: “Ji bo qebûlkirina Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, kampanya haştag di demeke kurt de bal kişand û bi sedhezaran mirov li seranserê cîhanê tevlî bûn. Herwiha gelek kesayetên siyasî yên navdar û berpirsên welatên din jî piştgirî dan kampanyayê. Bi tevlîbûna gelan kampanya li ser asta cîhanê ket rêza 3`yan û hê jî dewam dike.”

### `Çima xweseriya bakur û rojhilatê Sûriyê bi awayekî fermî nayê Qebûlkirin..!`

Ebdulhelîm bîr xist ku hêzên navneteweyî li ser xweseriya bakur û rojhilatê Surî baş tev nagerin û wiha berdewamî da gotinên xwe; “Dema em behsa qebûlkirina Rêvebeiya Xweser dikin, em ne behsa dewleteke serbixwe dikin. Ev rêveberî ne ya Kurdan tenê ye, ya tevayiya gelan e. Êdî bes e pêwîst e ev rêveberî wek statûyeke fermî li Rojava were qebûlkirin. Tevî ku têkîlî di asta herî bilind de tê kirin, lê hêzên navneteweyî liv û tevgera wan derbarê rêveberiyê de kêm e. Şandeyên rêveberiyê ne bi serokên dinyayê tenê re hevdîtinan dikin, ji aliyê nûnerên Neteweyên Yekbûyî ve jî tên pêşwazîkirin. Em jî dibêjin dema ku bi vê astê têkîlî çêdibin, çima wê demê ev rêveberî bi statûyeke fermî nayê qebûkirin! Ev nakokîyek e û metirsî ye.”

### ‘ENKS li dijî yêkîtiya kurdî û statûya Rêvebiriya Xweser e’

Nivîskar Ebdulhelîm Ehmed Lawî da zanîn ku ji despêka şoreşê heta roja îro ENKS li dijî statûya Rêveberiya Xweser e û axaftina xwe wiha qedand: “Ti caran ENKSê ji bo neteweya Kurdan hewl nedaye û yekîtiyê jî naxwaze. Herwiha serkeftinên li rojavayê Kurdistanê çêbûyîn, tev bi ked û têkoşîna şervanên YPG û YPJê çêbûne. Lê heta ku di nava partiyên Kurdan de yekîtî çênebe, xweseriya Kurdan ji aliyê cîhanê ve nayê qebulkirin. Ji bo wê divê her kes li gorî vê rastiyê tev bigere.”





# 3`yê Tebaxê roja reş û biêş

3yê Tebaxa 2014`an çeteyên DAIŞ`ê bi awayekî hovane êrişî Şingalê kirin û komkojiyeke mezin li ser gelê wê pêk anîn. Di komkujiyê de bi sedan Êzîdî kuştin û bi hezaran jin hatin revandin û wek kole hatin firotin. Piştî wê Şingalê hêza xwe ya parastinê ava kir, lê niha jî êriş li ser vê hêzê hene.



**Darîn Silê/Qamişlo**

Di 2014an de DAIŞê fermana 73`yan bi serê civaka Êzîdî de anî. Wê demê hêzên hikûmeta Iraqê û yên başûrê Kurdistanê, dev ji gelê Şingalê berdan û Êzîdî bi tena xwe hiştin. Bi hezaran mirov hatin kuştin. 5 hezar jin hatin revandin û wek kole li sûkan hatin firotin. Li hemberî armanca qirkirinê gerîlayên azadiyê, YPG û YPJ bi hêz û berxwedana xwe, li gelê Şingalê xwedî derkeftin û ji bo rizgarkirina Şingalê li hemberî DAIŞ’ê şer kirin. 13`ê Mijdara 2015`an Şingal ji DAIŞ’ê rêzgar kirin û piştî rêzgarkirinê bi demekê Êzîdiyan hêza xwe ya bi navê Yekîneyên Berxwedana Şingal (YBŞ) û Yêkîneyên Berxwedana Şengalê ya Jinan YBŞ-Jin ava kirin û ji wê demê ve bi hêza xwe ya cewherî parastina xwe dikin. Lê sala 2019an li ser plan û pirojeyên dewleta tirkî ya dagîrker ku bi riya DAIŞ’ê nikarî pêk bîne, PDK’ê nerazîbûna xwe li hemberî hêza parastina Şingalê diyar kir û bi dehê caran êrişê YBŞ’ê kirin. Herwiha dewleta tirkî ya faşîst bi dehê caran êrişên hewayî li ser Şingalê kirin û bi dehan ji gel û ji endamên parastinê şehîd xistin. Bi riya çekdarên PDK’ê û hikûmeta Iraq’ê Şingal xistîne nava dorpêçê.

Li ser salvegera heftan ya komkojiya Şingalê û rewşa niha hevserokê Nivîsgeha Karûbarên Ol û Baweriyan ya herêma Cizîrê Cibêr Şêx Silêman axivî û got, civaka Êzîdî ji bo kurdîtiyê stûnek e û wiha berdewamî da gotinên xwe “Di çanda Êzîdiyan de dîrokeke veşartî heye. Tirkiye Êzîdiyan wek stûneke Kurdan dibîne, ji bo wê her tim dixweze Kurdên Êzîdî qir bike. Heta niha êrişî Şingalê dikin û dixwazin fermaneke din bi serê Êzîdiyan de bînin. Lê Êzîdiyan bi vîneke mezin û bi ruhê berxwedanê planên Tirkiyê şkandin. Ne Tirkiye tenê, dewletên din jî destê wan di pêkanîna komkujiyê de heye. Bi taybetî hêzên hikûmeta Iraqê û yên başûrê Kurdistanê xiyanet li gelê Şingalê kirin. Berî wê tevayiya çekên welatiyan ji wan standin û gotin, ‘netirsin em li pişta we ne, emê parastina we bikin.’ Lê dema ku êrişê dest pê kir reviyan û Êzîdî bi tena xwe hiştin. Lê bi berxwedana gerîla Şingal hat rizgarkirin û hêza parastina rewa hat avakirin. Bi vê, vîna şingaliyan xurttir bûye û pêş ketiye. Jixwe yên rê li pêşiya Êzîdiyan vekirîn û rêzgar kirîn gerîla bûn.”



### `Tirkiyê dixwaze Rojhilata Navî bê Kurd, PDK jî dixwaze Şingal bê Êzîdî be`

Cibêr da xuyakirin ku di komkujiya Şingalê ya 2014`an de zêdetirî 5 hezarî jin hatin revandin û axaftina xwe wiha domand: “Di komkojiyê de gelek jin hatin kuştin û destdirêjî li wan hat kirin. Heta niha jî ev hesab nehatiye xwestin. Wê demê hikûmeta Iraqê û hêzên herêma Kurdistanê jî xwe vekişandin û parastina Şingalê nekirin. Çawa ku Tirkiye dixwaze Rojhilata Navî bêKurd be, Partiya Demokratîka Kurdistan (PDK) jî dixwaze başûrê Kurdistanê bê civaka Êzîdî be. Ev jî xetereke mezin li pêşiya yekîtiya Kurdan çêdike. Em jî dibêjin yên ku parastin nekirîn û rê li pêşiya dijmin vekirîn, nikarin derheqê Şingalê de xwedîbîryar bin. Hikûmeta başûrê Kurdistanê li hemberî komkujiyê parastina Şingalê nekir, ev jî tê wateya ku ew jî şirîka vê komkujiyê ye. Heta niha dewletên din jî ji bo vê komkujiyê bêdeng in. Lê gerîla, YPG û YPJ bi têkoşîn û qehremaniya xwe gelê Şingalê rizgar kirin.”

### ‘DAIŞ û Tirkiye xwediyên heman hişmendiyê ne’

Cibêr da diyarkirin ku kiryarên DAIŞ’ê li Şingalê pêk anîn dewlet Osmanî tîne bîra mirov û wiha got: “Tiştên ku DAIŞ li ser Kurdan pêk tîne tev kiryarên dewleta Osmanî ne ku nûjena wê niha Tirkiye ye. Berî sed salî dewleta Osmanî ev kiriyar pêk dianîn, niha jî dewleta tirkî û DAIŞ bi heman qirêjiyê xeta wê dişopînin.”

Hevserokê Nivîsgeha Karûbarên Ol û Baweriyan ya herêma Cizîrê Cibêr Şêx Silêman, bang li tevayiya partî û siyasetmedarên Kurd kir ku yêkîtiya xwe ava bikin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ez bi hêvî me Kurd tev bibin yek, çimkî eger yekîtî çênebe wê gelek fermanên din bi serê kurdan de werin. Bi taybetî civaka Êzîdî fermanên pir mezin bi serê wan de hatine, niha jî dixwazin fermana 74an bi serê me de bînin.”

## Endamên PYD’ê hatin berdan, yê Rêveberiya Xweser hê girtî ye



**Du endamên PYD’ê yên ji aliyê çekdarên PDK’ê ve hatîn revandin, hatin berdan. Lê Nûnerê Rêveberiya Xweser yê Hewlêrê nehat berdan.**

Nûnerê Têkiliyan yê PYD’ê yê Hewlêrê Mistefa Osman Xelîl, Nûnerê Rêveberiya Xweser yê Hewlêrê Cîhad Hesen û Endamê PYD’ê yê Hewlêrê Mistefa Ezîz Mistê 10’ê Hezîrana 2021’ê dema diçûn pêşwaziya mêvanên xwe, li Balafirgeha Hewlêrê ji aliyê çekdarên PDK`ê ve hatibûn revandin.

Derbarê sedema revandinê de heta niha rayedarên PDK’ê ti agahî nedabûn PYD’ê û Rêveberiya Xweser. Herwiha daxwaziyên hevdîtinê jî nehatibûn pêşwazîkirin.

Piştî 50 rojan Nûnerê Têkiliyan yê PYD’ê yê Hewlêrê Mistefa Osman Xelîl û Endamê PYD’ê yê Hewlêrê Mistefa Ezîz Mistê hatin berdan.

Lê Nûnerê Rêveberiya Xweser yê Hewlêrê Cîhad Hesen bê ku ti sedem werin nişandan, nehat berdan.

Li gorî agahiyên Nûnertiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ya bakûr û rojhilatê Sûriyê ya başûrê Kurdistanê dayîn, di dema girtinê de ti sûcdarî li ser her du endamên PYD’ê nehatina isbatkirin û bê ku derxin dadgehê hatine berdan.

Nûnerên Rêveberiya Xweser diyar kirin ku xwestine bizanin ka çima endamê wan Cîhad Hesen nehatiye berdan. Lê bersivek ji wan re nehatiye dayîn.

***Rojnews***

## Şingal



**Farûk Sakik**

Piştî ku Şingal ji DAIŞ’ê hat rizgarkirin li heremê di warê rêveberiyê de ji nû ve rêxistinbûyînê dest pê kir. Sîstema Xweseriya Demokratîk ku bingehê xwe ji fikir û ramanên Rêber Apo digire hat ragihandin. Meclîs hatin avakirin hemû gel û baweriyên li heremê xwe di nava vê sîstemê de birêxistin kirin.

Ev sîstema ku li vê derê hatibû avakirin bala cîhanê jî kişandibû. Sal derbas bûn li Îtalya dostên Kurdan insiyatîfek ku piştgiriyê dide doza Kurdistanê ava kirin. Komkujiya sala 2014’an û pêvajoya piştî rizgarkirinê bala vê insiyatîfê kişandibû û piştî demekê derbasî Şingalê bû.

Dixwestin di dermankirina birînên Şingalê de cih bigirin û li vê derê nexweşxaneyekê çêkin. Heman xebatên wan li Mexmûrê jî hebûn û li vê derê nexweşxaneyek jî ava kiribûn.

Di Tîrmehê de, di Stêrk Tv di bernameya Platforma Gel de, berdevka vê insiyatîfê mêvana min bû. Dema behsa gere xwe ya Kurdistan û çavderiyên xwe dikir, di heman demê de rastiya heremê bi awayekî objektîf dianî ziman. Digot, me Ocalan di teoriyê de nas dikir. Bi tenê pirtûkên wî xwendibûn û ji dostên me yên Kurd me perspektifên wî yên ji bo jiyaneke azad bihîstibûn. Dema ku em derbasî Şingale bûn, me paradîgmaya Ocalan di pratîkê de dît. Êdî me bawerî anî ku li dijî sîstema serdestan sîstema gelan pêkan e.

Ev sîstema hatî avakirin her çiqas dostên Kurdan keyfxweş kiribûn jî ewqas dijminên Kurdan jî tirsandibû. Dewleta tirkî ya dagîrker ji bo 2 tiştan Şingal ji xwe re kiribû armanc.

1- Riya xeyalên wan yên neo-osmanî di vê derê de derbas dibû.

2- Sîstema li vê derê hatibû avakirin wê ji heremê re bibûya emsal û belav bibûya.

Ji ber van sedeman êrîş kir. Bi ser neket. Bi hêzên heremê yên weke PDK û rejima Bexdayê re ket nava danûstandinan. Di 9’ê Cotmeha 2020’an de li ser statûya Şingalê li Bexdayê, li ser daxwaziya Tirkiyê, di navbera PDKê û rejima Bexdayê de peymanek hat imzekirin. Car caran hewldanên êrişan pêk hatin lê gelê Şingalê bi vîneke mezin li ber xwe da û ev pêlên êrişan têk birin.

Îro jî xêrnexwaz ji Şingaliyan yek tiştî dixwazin. Dibêjin şopên PKK’ê ji vê derê paqij bikin. Hêzên xwe yên parastinê belav bikin. Her kes baş dizane ku ev hêzên parastinê ji ciwanên Şingalê pêk tên. Rast e di nav wan de hin ciwanên heremê ku berê wek gerîla yan jî şervan şer kirîn jî hene. Van kesan di sala 2014’an de dema DAIŞê komkujî pêk anî, bi hawara malbatên xwe hatibûn. Sozek wan heye, heta metirsî û talukeya ser Şingalê berteref nebe wê li wê axê bimînin.

Di van demên dawî de hin kes radibin rûdinin bargehên PKK destnîşan dikin. Dibêjin ji başûrê Kurdistan derkevin, li Şingalê nemînin. Ev der axa Kurdistanê ye û wê gerîla biryar bide li kû dimîne yan namîne. Gaveke wêdetir diçin û dibêjin, çima posterên Rêber Apo li heremê tên daleqandin. Baş dikin ku Şingal bi wan posteran xemilandine. Û heta ji wan tê divû posterên mezintir daleqînin da ku kezeba wan dijminan reş bibe.

Yekîtiya neteweyî çi ye? Yekîtî xwedîderketina li sembolên welat e. Xwedîderketin û heskirina hêzên parastina welat e. Heskirina rêberê neteweyî ye.

Dijmin ji bo ku Kurdan ji van 3 nirxan dûr bixe siyaseteke taybet dimeşîne û hin hêzên Kurdan jî dibin parçeyek vê siyaseta dijmin.

Kurd divê li sîstema xweseriya Demokratîk ya Şingalê xwedî derkevin û ji bo parastin û zeximkirina vê sîstemê çi ji dest wan tê pêk bînin. Madem ku dijmin ev der ji xwe re kiriye armanc, dive Kurd jî xwedî derketina Şingalê ji xwe re bikin armanc.